Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1246 | 9-Sibat-2025 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218


## Sûretên zimanên jibîrçûyî




**Navenda Nûçeyan**

Wênegirê bi navê BA Van Sise ku li Emerîka dijî bi projeyeke cuda daye pey zimanên hatine jibîrkirin. Wî li gelek herêmên Emerîkayê sûretên kesên niştecih ên ku hewl didin zimanê xwe biparêzin girtine.

Di van rojên ku li Emerîkayê xelkên xwecih û zimanê wan her roj bêhtir tên jibîrkirin de, wênegirê bi navê BA Van Sise mohra xwe li xebateke gelekî girîng xistiye. Ji bo ku karibe li zimanên tên jibîrkirin bikole li seranserê welat geriyaye û wêneyên kesên ku bi van zimanên tên jibîrkirin re xebitiye. Wî rûyê van kesan bi konseptên cuda girtiye û albomeke xweşik ava kiriye di vî warî de. Piştî ku xebata xwe bi dawî kiriye bi wêneyên ku girtiye pêşangehekê jî vekiriye û her wiha wêneyên xwe weke albomekê jî daye çapkirin. Ji bo ew vê xebatê bibe serî 3 salan xebitiye û li gelek herêmên Emerîkayê wext bihurandiye.

BA Van Sise navê "On the National Language: The Poetry of America's Endangered Tongues" (Li Ser Zimanên Neteweyî: Helbesta zimanên di bin talûkeyê de yên Emerîka) li pirtûk û pêşangeha xwe kiriye. Wî qederê 80 wêneyên xelkên ku bi van zimanên di bin talûkeyê de diaxivin girtiye. Her wiha di derbarê her zimanî de agahiyan jî li albomê ango pirtûka xwe zêde kiriye. Wekî din wî behsa serpêhatiya 9 kesên ku hewl didin zimanê wan jibîr nebe jî kiriye û bi vî awayî behsa dîroka Emerîkayê kiriye. BA Van Sise dide zanîn ku xelkên xwecih bi zimanên xwe serbilind in û ji bilî serbilindiyê ew bi awayekî çalak ziman diparêzin jî.

Pêşangeha BA Van Sise di 17'ê vê mehê de (îro) li "Skirball Cultural Center" a li Los Angelesê vedibe. Ew bi vê pêşangehê dixwaze xelk van zimanên jibîrçûyî meraq bikin û zanibin gava ev ziman hatin jibîrkirin ew ê Emerîka di warê çandî de feqîrtir bibe.

**Kesên ziman diparêzin hevdû nas dikin**

BA Van Sise li Oklahomayê kesekî ku di hewla parastina zimanê xwe de ye nas dike û pişt re jî ev mesele jê re dibe meraq. Ew dixwaze bi rêya wêneyan rûyê van kesên ku hewl didin zimanê wan neyê jibîrkirin nîşan bide. BA Van Sise ji bo projeya xwe got; "Projeya min ji fikrên mêtingeriyê yên kevn bêhtir li ser insanên ciwan û siberojê ye. Lê ji vî tiştê jî girîngtir; kesên ku di hewla parastina zimanê xwe de ne û nahêlin zimanê wan were jibîrkirin hay ji hevdû hene û hevdû nas dikin." Ji xwe piştî hevdîtinê bi kesekî re dike ew kes wî bi gelek kesên din re jî dide nasîn û naveroka projeyê bi vî awayî xurtir dibe. BA Van Sise jî derdikeve dervayî sînorên konfora xwe û heta jê tê diçe cihên dûr û xwe digihîne zimanparêzan û wêneyên wan ên xweşik digire.

**Ji bo ciwanan û nifşên nû**

BA Van Sise bi vê projeyê herî zêde dixwaze bala ciwanan ango nifşên nû bibe ser van zimanên ku her roj hinek din tên jibîrikirin û dibêje; "Divê em ji wê çanda ku tenê li jiyana xwe ya kesane difikire dûr bikevin. Ev hişmendiyeke ne baş e. Divê em têbighîjin ku hemû çand bi hevdû ve girêdayî ne û dewlemendiya civakê ne. Ji xwe dîrok û siberoja me jî bi hevdû ve girêdayî ye. Ji lewma herî zêde jî dixwazim ciwan vê projeyê bibînin û fam bikin ku ev çandên dewlemend gelek qalibên heyî şikandine. Bi hêviya ku di feraseta nifşê nû de di derbarê zimanên tên jibîrkirin de tiştekî bi cih bikim û çirûskekê vêxim. Ew dikarin fêrî van zimanan jî bibin û hay ji van çandên dewlemend hebin. Ji lewma her çandek dinyayeke cuda ye."

Di pêvajoya vê projeyê de hin zehmetî jî derketin pêşiya BA Van Sise. Gava ew li Pennsylvania dixwaze wêneyê Sylvan Esh bigire, nikare wisa bi rehetî bigire. Ji bo ku dilsoziya xwe nîşan bide û xelkên li wir jî pê bawer bibin hewcebû ku 4 rojan li çewliga wan bimîne û xwe bide qebûlkirin. Piştî çar rojan dikare tenê wêneyekî bigire û ev wêne jî ji paş ve hatiye girtin.

## TEV-EKO: Êrîşên dewleta Tirk ji bo ekolojiyê jî dibin sedema metirsiyê



TEV-EKO'yê nerazîbûn nîşanî êrîşên dagirkeriyê yên li ser Rojava dan û got, "Tehrîbkirina bizanebûn a heyînên ekolojîk, sûcekî li dijî mirovahiyê ye. Em bangî her kesî dikin ku bertekeke mezintir nîşan bidin."

Tevgera Ekolojiyê ya Kurdistan-Ewropayê (TEV-EKO)'yê li ser êrîşên dagirkeriyê ên li dijî Bendava Tişrînê daxuyaniyeke nivîskî da.

Daxuyani wiha ye: "Dewleta Tirk û kêmên girêdayî wê yên cîhadîst, ev demeke dirêj e embarên dexlî, binesaziya av û karebayê, qadên jiyana sivîl ên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi êrîşan ji holê radike. Êrîşên li ser zad, av û karebayê texrîbateke mezin çêdikin. Tevî ku Rojhilata Navîn bi metirsiya hişkahiyê re rûbirû ye, ev êrîşên çavkanî û binesaziya avê hedef digirin, ne tenê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, hemû heyînên li vê herêmê dikin hedef."

Di daxuyaniyê de hat destnîşan kirin ku "Texrîbkirina bizanebûn ya heyînên ekolojîk, sûcekî li dijî mirovajiyê ye. Bi van êrîşan sûcên şer tê kirin. Ev êrîş dê di li herêmê demeke dirêj hişk, bêrih û qirêj bihêle û dê berê herêmê bidin tunebûneke bê siberoj."

Berdewama daxuyaniyê wiha ye: "Herêma Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xwedî giringiyeke mezin e. Loma helwesta li hember rêveberiya xweser, ji bo avakirina siberojeke aram pîvana sereke ye. Di serî de raya giştî ya li hember ekolojiyê hesas, em dixwazin bangî hemû aliyên demokratîk bikin; Dewleta Tirk û komên cîhadîst ên girêdayî wê careke din hebûna avê li dijî civak û xwezayê wekî çekekê bi kar tîne. Herêma Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xwedî avaniyeke demokratîk, ekolojîk û li ser esasê azadiya jinan e. Parastina vê avaniyê di serî de erka me ye. Di vê wateyê de em bangî her kesî dikin ku li dijî êrîşan dengê xwe bilindtir bikin û bertek nîşan bidin."

### Sudoku: Bersiv 26

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 6 | 4 | 9 | 2 | 3 | 8 | 7 | 5 |
| 3 | 9 | 8 | 7 | 1 | 5 | 4 | 6 | 2 |
| 2 | 5 | 7 | 8 | 4 | 6 | 9 | 3 | 1 |
| 6 | 1 | 5 | 3 | 8 | 4 | 2 | 9 | 7 |
| 4 | 2 | 3 | 6 | 7 | 9 | 1 | 5 | 8 |
| 8 | 7 | 9 | 2 | 5 | 1 | 3 | 4 | 6 |
| 5 | 4 | 6 | 1 | 9 | 2 | 7 | 8 | 3 |
| 7 | 3 | 1 | 4 | 6 | 8 | 5 | 2 | 9 |
| 9 | 8 | 2 | 5 | 3 | 7 | 6 | 1 | 4 |

### Sudoku:Pirs 27

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 7 | | | | 5 | 8 | | |
| | | | 2 | 7 | | | 1 | 4 |
| | | 2 | 8 | | 6 | 5 | | 7 |
| | | 1 | 4 | | | | | |
| | | | 9 | 1 | 7 | | | |
| | | | | | 8 | 2 | | |
| 1 | | 4 | 3 | | 9 | 7 | | |
| 3 | 8 | | | 2 | 4 | | | |
| | | 6 | 5 | | | | 2 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Eger gayekî baş bûya wê li gêra xwe bûya:**
- Bi heman wateyê.

**Fît mane bi xema yên bêlêv ve:**
- Kar maye bi hêviya kesê bêkêr ve.

**Gêre bi golikan nabe:**
- Karên girîng seresere nabin; ji bo karên girîng amadekariyên girîng divên.

**Hedad e, nikare ji xwe re mifteyekê çeke pê deriyê xwe dade:**
- Li ber çavan zana xuya dike, lê ne wisa ye.

**Hemû çûkan hêjîr bixwaran lib ji Şax û Hevler nedima:**
- Tu bi kêrî wî karî nayî; karê ku ne karê te be tu xwe di ber re dikî. (Şax û Hevler du gundên Silopya ne, hêjîrên wan pir in)

**Heta çavek derman kir, yek jî kor kir:**
- Heta tiştekî baş dike, deh tiştan xirab dike.

**Heta malek ava kir, şarek wêran kir:**
- Heta tiştek çêkir, deh tişt xirab kirin.

**Jarê li min jarê, pîso çû hawarê:**
- Nîşana wî qasî ye ku mêr, yan jî kesên bikêr nemane.

**Ji cot û cercereyê re nabe, lê ji gelefekan re bav û bira ye:**
- Bi kêrî kar û bar nayê, lê ji keyf û henekan re pir baş e. (Bikirê ga ji xwedî re dibêje; çi eybên gayê te hene, xwedî dibêje; ji cot û cercereyê re nabe, lê ji gelefekan re bav û bira ye)

**Ji her darê bilûr û tembûr çênabin:**
- Her kes bi kêrî her karî nayê.

**Ji her hesinî şûr çênabe:**
- Bi heman wateyê.

Ji tevin û teşiyan re na weleh, ji **qulopon re eyweleh:**
- Bi kêrî kar û bar nayê, lê ji keyf û henekan re pir baş e..

**Ka çawa xaliq e wisa jî mexlûq e:**
- Tiştên wî, kirinên wî, berhemên wî jî li gorî wî ne; ka çawa ew bi kêrî tiştekî nayê tiştên wî jî bikêrî tiştekî nayên.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Bi balafirên şer jî wê nikaribin vîna me bişkînin'



Reveberiya HPC-Jin Selamet Hecî diyar kir ku çawa wan di destpêka şoreşê de bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî axa xwe ji çeteyên DAÎŞ'ê parast, ew ê îro jî bi heman rihî axa xwe ji dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê biparêzin.**R-2**

## YRD: Em ê têkoşîna Şehîd Azîz bi serkeftinê tacîdar bikin



YRD'ê diyar kir ku 27'ê Çileyê dewleta Tirk bi rengekî tirsonekî li Ranyayê êriş pêk anî û di encamê de rojnamevan Azîz Koyluoglû şehîd bû û wiha got: "Helbet pênûsa hevrê Azîz li erdê namîne, deng û gotina wî dê hîn xurttir bibe."**R-3**



Ronahî — Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1246 | 9-Sibat-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S




## 'Tirkiyê dijminê gelên Sûriyê ye û hevalê berjewndiyên xwe ye'

Serokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanî, Telal Mihemed anî ziman ku dagirkeriya Tirk dixwaze bi riya têkiliyên xwe bi rêveberiya nû ya Sûriyê re destwerdanê bike. Herwiha Mihemed tekez kir ku dagirkeriya Tirk dijminê gelên Sûriyê ye û hevalê berjewndiyên xwe ye.**R-4**

# DIVÊ ROJA REŞ BIBE ROJA RONAHÎ Û AZADIYÊ



Komploya Navnetewî dikeve 27 saliya xwe. Rêber Apo bi guhertina paradîgma bersiv da komplo û komplogeran. Hişmendiya modernîteya demokratîk ku li ser hîmê Netewa Demokratîk dimeşe ava kir. Paradîgmaya Netewa Demokratîk ku paradîgmaya jina azad û gelên azad e, pêşxist. Teslîmiyet red kir û nehişt ku kompoger bighêjin armanca xwe. Îro, paradîgmaya Netewa Demokratîk ku xwe dispêre demokrasî, ekolojî û azadîya jinê, hem ji gelên bindest re hem jî ji hemû derdorên şoreşger re bûye îlhama têkoşîn û berxwedaniyê.**R-5**



## 'Bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî wê bendav bi ser bikeve'

Dayik û bavên ku temenê 80 salî derbas kirine, bi hemû hêz û îradeya xwe, li bendava berxwedanê ya Tişrînê nobeta parastinê digrin.**R-6**



## 'Bendava Tişrînê bûye keleha berxwedanê'

Endamê Şanoya Çiya Simko Cûdî diyar kir ku berxwedaniyeke bêhempa li Bendava Tişrînê ji aliyê gel û şervanan ve tê kirin û heta niha berdewame û got: " Bi rihê şerê Gelê Şoreşgerî gelên herêmê berê xwe dan Bendava berxwedanê û ez jî weke şanogerekî ji bo bilind kirina coşa gel û şervanên di çeperên şer de min jî berê xwe da Bendava Tişrînê."**R-7**



**Doh terorîst bû, îro bû birayê ezîz!**
Ahmet Aktaş — R-4



**Gelê ku heyranê azadiyê be, jîndar e**
Idrîs Henan — R-5

# ‘Li Sûriyê ji ber hişmendiya paşverû jin tên kuştin’

Di serdema ku felsefeya Jin Jiyan Azadî dengê jinên kurd derbas dike û dibe hêza hemû jinên cîhanê, herwiha di meydanan de hişmendiya dewlet û mêrperest têk dibe; Kelema ku dixwaze vê hêzê tune bike jî her di hewildanê de ye. Gelo mayîndebûna vê zihniyetê bi kuştina jinê ye?

**Esma Miştefa/ Qamişlo**

Pargala ku li ser pûçkirina îrade û tunebûna hebûna jinê hatiye avakirin, wê nikaribe sekna jina azad qebûl bike. Ev diyarde jî di pergala heyî de rojane tê îsbatkirin. Hişmendiya ku dewlet û dewleta biçûk (malbat) li ser hatiye terbiyekirin, hebûna jina serbixwe û xwedî îrade di civakê de qebûl nake, ji ber ger îrade û hêzek pê re hebe, wê demê wê çawa serweriya xwe feriz bike? wê çawa hêza xwe hîs bike? Herwiha gelek sedemên din jî hene. Ji ber van hişmendiyan tu pergal hebûna jin ya serfiraz û azad napejrîne û li hember wê jî gelek cureyên şer dide meşandin.

Di vê serdemê de felsefeya ku li hember van zihniyetan sekiniye û pişperdeya wan eşkere kiriye jî felsefeya Rêber Abdullah Ocalan e. Bi kêm gotinan silogana Jin Jiya Azadî bi têkoşîn û berxwedana jina Kurd dibe felsefeya azadî û wekheviyê di hemû cîhanê de. Bi taybet di Sûriyê de rûxmî hemû geşedanên siyasî û civakî û bi hilweşîna rêjîma Bass re, em dibînin ku careke din rojane jin li meydanan bi sûcên ne diyar û bi kesên mechûl têne kuştin. Têkildarî kuştina jinan di Sûriyê de Rêveberiya Rêxistina Sara a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Arzo Temo li gel rojnameya me axivî.



## Di Rojhilata Navîn de kuştina jin

Arzo Temo di destpêkê de bal kişand ser tundiya li dijî jin di Rojhilata Navîn de û wiha got: “Diyardeyên tundiya li dijî jinê xwe disipêre bi hezaran salan e, ev yek xwe ji hişmendiya ku civak li ser wê hatiye mezinkirin digre. Tundî li ser jinê di tavahî cîhanê de kêlî bi kêlî tê bikaranîn. Lê bi taybet em dixwazin balê bikşînin ser Rojhilata Navîn ku bi gelek rêûrêbazên tund tê ferizkirin. Herî zêde di Rojhilata Navîn de jin di bin navê şeref û namûsê de tê kuştin. Ji ber vê em dibînin ku di bin navê îslamiyeta radîkal de çawa jin tê bikaranîn û xapandin, da ku teşeyekî derveyî cewherê jinê lê bikin. bê guman ev yek jî weke xapandine ne ku dixwazin ola îslamê pêk bînin. Bi navê Ola îslamê jin bê kuştin, ev yek tu carî nehatiye gotin û nayê qebûlkirin jî. Ji ber wê yekê divê em di wê zanebûnê de bin ku jin bi gelemperî di Rojhilata Navîn de di bin navê ol de tê kuştin.”

## `Hêviyên me ne ev bûn`

Arzo Temo da zanîn ku li Sûriyê piştî rûxana rêjîma Esed, ew bi hêvî bûn ku sîstemeke baştir were rûnişkandin û wiha domand: “Di sîstema rêjîma Bass de ku ew jî yek ji sîstemên hegomonîk yên cîhanê bû û tenê ji bo xizmeta berjewendiyên xwe gel bi rêve dibir. Di nav de jî bi heman zihniyetê nêz jinê dibûn û jin bi qebûlkirina xwe ku ew hêmana bê deng di civakê û dewletê de ye; nêz hebûna xwe dibû. Piştî rûxandina ev sîstema dîktator em bi hêvî bûn ku sîstemeke bi rastî bibe dengê hemû gelên bindest ku bi rastî mafê her kesî têde bê parastin û hebûna tu zayend û netewekê neyê tundekirin. Lê mixabin ev sîstema nû daha zêtdetir li hember jin û îradeya wê sekiniye. Ev yek jî bi mînak û axaftinên ku em lê bûne şahid tînin ziman, yek ji wan jî Ayşe Dibis ku jineke Sûrî ye, derket ser ekranê û di encûmenên ku hatine rêxistinkirin de bi yek gotinê got `mafê û hiqûqê jinê tenê mal, zarok û hevjîna wê ye` yek jin derket ew jî li gorî fikir û zihniyeta zilamperest ya hezar salan xîtaba xwe kir. Jina ku li ser destê dewleta Tirk hatiye terbiyekirin, gelo wê bikaribe ji hemû jinên Sûriyê û ji mafê jinê re bibe cihê careseriyê?

Mixabin hêviya me ne ev bû, hêviya me ku ev jin, me û hemû tevgerên ku ji bo jinê kar dikin vexwîne û li ser doz, hebûn, maf û çawaniya pêşxistina jinê em nîqaş bikin. Ji tecrûbe û xebatên ku me di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dane avakirin, bipirse, nasbike da ku em vê modêlê di hemû Sûriyê de bi cih bikin. Lê xîtaba ku hatiye kirin, îfade kir ku ev jin tu têkiliya wê ji bo avakirina bingeha jiyaneke hevbeş tê de mafê jinê parastî be nebû.”

## `Bi tewan û sûcên nediyar jin tê kuştin`

Arzo Temo di dewama axaftina xwe de bilêv kir ku di Sûriyê de jin bi sûc û tewanên ne diyar têne kûştin û wiha got: “Di van demên dawiyê de gelek piratîkên ku banga ferizkirina îslametiyê di Sûriyê de têne kirin. Di nîvê Mezê de hin kesên cîhadî rabûn û bi şûran cilên îslamî li ser jinê feriz kirin, herwiha pankartên hişyariyê yên cilên jinan belav kirin. Ev yek me vedigerîne dîroka DAÎŞ’ê ku çawa bi tundî cilên îslamî li ser jinê ferizdikirin. Bi rastî jî di van demê dawiyê de gelek jin bi tewan û sûcên nediyar hatin kuştin, bi taybet jinên Elewî ji ber mezheba xwe hatin kuştin û ev sûc heyanî niha jî nehatine eşkerekirin û kûjer jî nehatine cezakirin. Ji bilî wê bûyerek li Siwêda hat qewmandin ku keçikek 20 salî destdirêjî ji aliyê bavê xwe ve didît, herî dawî ji bo neyê eşkerekirin keçika bi navê Lîlyan bi kîran hate kuştin û bavê wê bi gotina ku kêmaqile nehat cezakirin. Divê sîstemek, zagonek hebe da ku li pêşiya van bûyeran were girtin, lê mixabin ev pêvajoya tevlîhev di Sûriyê de wê pêşî li hember gelek binpêkirinan veke.”

## `Tundiya li ser jinê ne qeder e`

Arzo Temo di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: “Tundiya li ser jinê tê ferizkirin ne qeder e û ji bo guhartina çarenûsa wê çi ji me bê xwestin em ê bikin û em ji bo wê yekê têkoşîn dikin. li ser vê bingehê emê hewildanên xwe yên danûstandinê bi hemû aliyan re bikin, xebata ku me ji bo têkoşîna li hember tundiya li ser jinê daye destpêkirin emê di hemû Sûriyê de bimeşînin. Herwiha em bang li tavahî tevger û rêxistinên jin yên navnetewî dikin ku berê xwe bidin van bûyeran û xwe li hember van diyardeyan berpirisyar bibînin. Divê werin û hemû binpêkirinan di herêmên dagirkirî û tavahî Sûriyê de belge bikin û ji raya giştî re eşkere bikin.”

# ‘Bi balafirên şer jî wê nikaribin vîna me bişkînin’

**Tekoşîna Amara/ Qamişlo**

**Reveberiya HPC-Jin Selamet Hecî diyar kir ku çawa wan di destpêka şoreşê de bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî axa xwe ji çeteyên DAÎŞ’ê parast, ew ê îro jî bi heman rihî axa xwe ji dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê biparêzin.**

Ji ber ku parastina axa welat bingeha tevahî xebat û karê civakê ye, pêwîstî bi avakirina hêzeke civakî ku gel bi xwe  parastina xwe bike hebû. Ji destpêka Şoreşa Rojava ve,  parastina cewherî hat avakirin û roleke mezin di parastina civakê de lîst. Herwiha ji ber ku jinê pêşengiya Şoreşê kir û hebûna xwe di tevahiya qadan de isbat kir, hebûna wê ya di nava Hêzên Parastina Cewherî de serkeftinek ji vê hêzê re bû.

Di derbarê girîngiya rola Hêzên Parastina Cewherî HPC û HPC-JIN di parastina civakê de, Rêveberiya Jin a Hêzên Parastina Cewherî a Bajarê Dêrikê Selamet Hecî ji rojnameya me re axivî.

## ‘Pêwîste hemû beşên civakê parastina xwe bi xwe bikin’

Selamet Hecî di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Ji bo her hebûneke zindî  xweparastin pêwîste. Mafê ewlekarî û parastinê ji tu kesî re nayê dayîn. Çawa ku her zindî parastina xwe bi xwe dike, divê hemû beşên civakî jî parastina xwe bikin û libenda tu hêzeke derve nemînin da ku wan biparêze. Li bendmayîna parastinê ji hêzeke derve tê wateya mirinê. Ji bo civakê lawazbûn, bêrêxstinkirin û bêtêkoşînkirin tê wateya teslîmbûn û qebûlkirina koletiyê. Li cihê ku xweparastin tune be koletî dest pê dike. Ji bo gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê jî xweparastin ji her tiştî girîngtire.”

## ‘Xweparastin hêmaneke girînge’

Selamet Hecî da xuyakirin ku rola HPC û HPC-JIN di rêxistinkirina Şerê Gelê Şorşgerî de bingehe û wiha domand: “Me hewil da ku di vê pêvajoya xeternak de parastina tax, gund û bajarên xwe bikin, ji bo me xweparastin tê wateya hebûnê. Ew jî mîna xwarin û xwezêdekirinê hêmaneke girîng e. Di heman demê de xweparastin parastina mafê jiyanê ye, parastina hebûna gelan a li hemberî rastiya dewleta netewe ya qirker e. Em xweparastinê weke yek ji şêweyên hebûna sîstema şaristaniya demokratîk dibînin. Êdî gelê kurd ne ew gêlê ku bi êrişên dewleta Tirk re dev ji axa xwe berde, em vê rastiyê piştguh nekin. Derveyî têkoşîn û berxwedanê tiştek me nemaye.”

## ‘Em ê bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî av û axa xwe biparêzin’

Selamet di axaftina xwe de behsa êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li Bendava Tişrînê kir û wiha got: “Dewleta Tirk a dagirker piştî şerê Minbicê xeyal dikir ku bendava Tişrîn û pira Qaraqozaxê dagir bike. Gelên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina av, ax û elektirîka xwe  bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî berê xwe dan bendava Tişrînê. Di êrişên li ser bendava Tişrînê de carek din derket holê ku dewleta Tirk a dagirker sûcên şer li dijî gelê sivîl pêk tîne. Dewleta Tirk û çeteyên wê difikirin ku ew ê bi komkujiyan gel bitirsîne, lê em ne ji balafiran ne jî ji topên wan ditirsin, me xwe li ser fikrê Netewa Demokratîk birêxistin kiriye.”

## ‘Hebûna me bi hêza me ye, kes nikare vîna me bişkîne’

Selamet Hecî diyar kir ku gelên Bakûr û Rojhilate Sûriyê bi hêza xwe ya leşkerî û îradeya xwe hene, tu kes nikare vîna wan bişkîne û wiha li axaftina xwe zêde kir: “Dewleta Tirk a dagirker bi rêya şerê taybet dixwaze di nava gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de tevlîheviyê avabike. Em wek HPC û HPC-Jin, li hemberî şerê taybet yê ku dewleta tirk dixwaze bi rêya malperên xwe li ser civakê bide meşandin, em civînan ji gel re çêdikin û hewil didin siyaseta şerê taybet vala derxin. Li ser van bingehan gelê Dêrikê ji heft heta heftê salî ji bo parastina tax û bajarê xwe ketine nav seferberiyê de.”

## ‘Tabûrên me li kêlek hêzên QSD-YPJ şer dikin’

Selamet Hecî di axaftina xwe de ev anî ziman: “Tabûrên me yên ku di destpêkirina şerê li ser herêmê de hatibûn avakirin, carek din hatin komkirin û civîn li ser pêvajoya heyî hatin çêkirin. Gelek tabûrên me niha li kêleka şervanên YPJ’ê



û QSD’ê di eniya pêş de cih digrin û li berxwe didin. Çawa ku îro Şerê Gelê Şoreşgerî li taxan tê meşandin, bi heman rihî gel berê xwe dide bendava Tişrînê jî. Berxwedana ku îro gel li bendavê dimeşîne bê hempaye,  dewleta Tirk nikare bi balafiran jî gel bitirsîne. Em wek gel nahêlên ku dewleta Tirk di axa Bakûr û Rojhilatê Sûriyê de bijî. Ax axa me ye û em ê dijminê xwe tu carî qebûl nakin. Wek HPC-HPC-JIN tiştê ku dikeve ser mile me, em ê pêk bînin. Niha gelê Dêrîkê ji heft heta heftê salî amade ye ku taxên xwe ji dagirkeran biparêze.”

Rêveberiya Jin a Hêzên Parastina Cewherî a Bajarê Dêrikê Selamet Hecî di dawiya axaftina xwe de bang li hemû gelên herêmê kir ku li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî jiyana xwe birêxistin bikin û bi beşdariya xwe ya nava refên parastinê, xwe bi hêztir bikin.



# ‘Bendava Tişrînê bûye keleha berxwedanê’

Endamê Şanoya Çiya Simko Cûdî diyar kir ku berxwedaniyeke bêhempa li Bendava Tişrînê ji aliyê gel û şervanan ve tê kirin û heta niha berdewame û got: “ Bi rihê şerê Gelê Şoreşgerî gelên herêmê berê xwe dan Bendava berxwedanê û ez jî weke şanogerekî ji bo bilind kirina  coşa  gel û şervanên di çeperên şer de min jî berê xwe da Bendava Tişrînê.”

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Dewleta Tirk û çeteyên wê di 8’ê Berfanbara 2024’ an de bi awayekî hovane êrişî Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê dikin. Herwiha gelên herêmê ji bo ku piştgirtiya şervanên QSD’ê bikin, bi coşeke mezin cihê xwe di nava berxwedaniyê de girtin û nehiştin ku Bendava Tişrînê bikeve destê dewleta Tirk û çeteyên wê de. Di heman demê de dewleta Tirk a dagirker bi balafirên bêmirov êrişî sivîlan dike û di encama êrişîn dewleta Tirk a dagirker de bi dehan şehîd û birîndar çêbûn.

Di derbarê Berxwedana li Bendava Tişrînê de endamê Şanoya Çiya, Simko Cûdî ji Rojnameya me re axivî.

## ‘Bendava Tişrînê bûye nasnameya gelê azadîxwaz’

Simko Cûdî anî ziman ku berxwedana li Bendava Tişrînê tê kirin berxwedaniyeke bêhempa ye û wiha got: “ Ez jî weke şanogerekî tevlî çalakiya nobetê bûm û gelên herêmê bi rihê şerê gelê şoreşgerî berê xwe dane bendavê, herwiha  hemû kêliyên xwe ji bo azadî, demukrasî û jiyana biromet bijîn bi awayekî têgihiştî berxwedaniyeke bêhempa li bendava berxwedanê didin meşandin. Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhatiyên xwe li herêmê şerê hebûnê didin meşandin. Li Bendava Tişrînê av, ax û xwîn bûye yek devera ku av, ax û xwîn dibe yek tucarî nakeve û li ser vî bingehî Bendava Tişrînê bûye kelha Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Di heman demê de em ê heta dawiyê bendavê biparêzin, ji ber ku Bendava Tişrînê bûye nasnameya gelê azadîxwaz û em ê heta dawiyê parastina wê bikin.”

## ‘Bi rihê şerê gelê şoreşgerî gelê herêmê li ber xwe dide’

Simko Cûdî da zanîn ku ev zêdetirî 50 rojî ye li Bendava Tişrînê berxwedaniyeke mezin ji aliyê şervan û gel ve tê kirin û wiha berdewam kir:“ Dewletên cîhanê bi giştî ji berxwedana ku li Bendava Tişrînê tê kirin matmayî dimînin, herwiha bi têgiştineke pir mezin bi rihê şerê gelê şoreşgerî û bi taybet gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji her aliyî ve têkoşînê didin meşandin. Di heman demê de ez weke şanogerekî dema ku derbasî bendava berxwedanê bûm, piştî koma bajarê Qamişlo û kêliyên ku em berî bigihêjin bendavê em bi şehadeta Cuma Xelî (Bavê Teyar) bihîst. Bavê Teyar yek ji mîrasa şanoya kurdî li Rojavayê Kurdistanê bû û ew yek ji yê herî sereke bû ku kar û xebatên şanoyê didan meşandin. Ez jî weke şanogerekî ji bo ku bi erkê xwe rabim li Bendava Tişrînê me şanoyek pêşkêş kir, me ev şano diyarî giyanê Bavê Teyar kir, tevahî şehîd û gelên li bendava berxwedanê kir. Berî ku em dest bi şanoyê bikin, dewleta Tirk bi balafirên xwe ên bêmirovî li nêzî cihê me bi 50’î mitreyî êriş kir û di hundirê şanoyê de careke din li nêzî cihê me topbaran kir û di encamê de gelek kes birîndarbûn û ez yek ji wan kesan bûm.





## Naveroka şanoyê

Endamê Şanoya Çiya Simko Cûdî axaftina xwe wiha bi dawî kir: “ Navê Şanoya ku me li Bendava Tişrînê çêkir bi navê  ‘Rûmet’ bû. Herwiha naveroka şanoyê li ser berxwedana ku li Bendava Tişrînê tê kirin, ku çawa gel û şervan li bendavê bi hev re berxwedaniyê dikin. Di heman demê de ji bo min hestekî pir cuda bû, ji ber ku min tucarî şanoyeke bi vî rengî pêşkêş nekiriye û kesên ku şano temaşedikirin berxwedêrên li bendavê bûn. Pêşengên şanoyê ên ku li tevahî Kurdistanê qehremaniyek didan meşandin îro careke din li Bendava Tişrînê qehremantiya xwe pêşkêş bikin.Kesên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hunerê bikin bila biçe Bendava Tişrînê hunerê pêşkêş bike, ji ber jiyana li wir jiyaneke hevpare û berxwedaniyeke mezin li wir tê meşandin. Ji aliyê şervan û gel ve berxwedanî berdewame û rojane dewleta Tirk a dagirker bi balafirên xwe ên bêmirov êrişî sivîlan dike û armanca wê ku îradeya gelê kurd bişkîne. Bangewaziya min ji tevahî hunermendên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku berê xwe bidin Bendava Tişrînê û kar û xebatên xwe yên çand û hunerê li wir bidin meşandin.”

# ‘Helwestên kurdên li Ewropa ji bo piştevaniya şoreşê şermok in’

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Rewşenbîra jin Anahîta Sîno da zanîn ku hemwelatiyên kurd ên li Ewropayê ji bo piştevaniya şoreşê xebatekê dikin, lê li hemberî berxwedaniya ku şervanên QSD’ê dimeşîne, xebata wan kêm û şermok e û got, Pêwîste kurd, bi rewşenbîr û siyasetmedarên xwe ve asta xebata xwe di warê ragihandinê de xurtir bikin.**

Gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê di demeke hestiyar re derbas dibin, herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rastî êriş û gefên dagirkeriyê tê. Di vê rewşa zehmet de jî çavên kurdên Rojava li destek û piştigiriya civaka kurdî ya li Ewripayê ye. Derbarê heman mijarê de, rewşenbîra jin Anahîta Sîno bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn jî wiha bû:

**Hûn xebata rewşenbîrî, civakî û siyasî ya civaka kurdên Rojava yên ku li Ewripa dimînin di çarçoveya piştgiriya Şoreşa Rojava de çawa dinirxînin?**

Zêdeyî 13 salan e ku li Rojavayê Kurdistanê şoreşek bi serkêşiya jinê tê meşandin, ji xwe destkeftiyên



ku vê şoreşê qezenc kirine li ber çavan in. Niha jî li Bendava Tişrînê, bendava şehîdan şervanên me berxwedaniyeke dîrokî dikin û li cîhanê tevî weke vê berxwedaniyê nehatiye dîtin. Ev bendav û bajarê Kobanê ji bo dewleta Tirk bûye kabûsek. Ji wê dema ku DAIŞ di Kobanê de şikest, êş û kîn di dilê dewleta Tirk de ye. Lewma jî dagirkeriya Tirk dixwaze bendava Tişrînê bixe bin destê xwe da daku Kobanê dagir bike, gelê kurd û hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî soza xwe bide ku heta yek ji wan sax e ew ê nehêlin Kobanê were dagirkirin. Mixabin tişta ku em jê diêşin ew e ku ragihandina cîhanê balê nakişîne ser berxwedana Bendava Tişrînê, lê tenê ragihandina me vê yekê ji nêz ve dişopîne.  Di roja îro de gelek hemwelatiyên me yên kurd ber bi welatên Ewripî û cîhanê koçber bûne. Kesên siyasetmedar, rewşenbîr û hwd… heya radeyekê xebatekê ji bo piştevaniya Rojava dikin. Nemaze ji wan, Şoreş Derwîş, ew li ser hemû dezgehên ragihandina cîhanê derdikeve û berevaniya gelê kurd û Şoreşa Rojava dike. Herwiha Derwîş rastiyê û gelek xalan zelal dike, em jî hewcedarî vê yekê ne, ji bilî wê jî hejmarek ji rewşenbîr û siyasetmedar derdikevin ser mediya dijîtal û analîzan parve dikin. Herwiha em dibînin ku gel dadikevin qadan, meş û daxuyaniyan li dardixin. Em dibînin ku xebatek tê kirin, lê bi rengekî şermok helwestên wan tên xuyakirin û li hemberî berxwedaniya ku li Rojava tê kirin kêm dimîne.

**Di warê xwedîderketina li Şoreşa Rojava çi dibe astengî li pêşiya xebata gelê kurd li Ewripayê?**

Kurdên Rojava ku li Ewripa dijî, ne dûrî şoreşê ne, em bêjin nebêjin evder welatê wan e. Lê belê xemsariyek ji aliyê kurdên me yên li derve dijîn heye. Di vê demê de nakokiyên siyasî yên partiyên kurdî bandor li hemû qadên civakî kiriye. Ango girêdana kurdan bi partiyetî û berjewendiyên partiyan ve heye. Em dizanin ku nakokiyên di navbera partiyên me yên kurdî de, di nav civaka me bi rewşenbîr û hemû kesî de tê dîtin. Di vê dema hestiyar de eger em bibînin siyasetmedar an jî rewşenbîrên me li gorî berjewendiyên xwe tevbigerin, wê tiştekî şaş be. Weke em dizanin pirrengiya rewşenbîr û siyasetmedarên me ne tiştekî xerab e, her aliyek xwedî nêrînekê ye. Lê belê ya girîng ji me re yekbûna daxwaza rewşenbîr, siyasetmedar û hemû qadên civakê ye. Niha xebatek heya astekê destnîşankirî tê kirin, lê piraniya kurdên me yên li Ewripayê dûrî mijara şoreşê ketine. Em dibêjin ku eger îro hûn ji bo Şoreşa Rojava danekevin qadan, di siberojê de pêwîst nake hûn derkevin. Ji ber ku îro gelê kurd di rewşke zehmet de dijîn. Kurdên li Rojava hewcedarî hawara xelkên xwe yên derveyî welat in. Eger destkeftiyên kurdan neyên parastin heta sedsaleke din jî em ê nikaribin mijara kurdewariyê bînin ser ziman.

**Erka ku dikeve ser milê tevgerên kurdî yên rewşenbîrî, civakî, siyasî û hwd…. ên li derveyî welat ji bo piştgiriya Şoreşa Rojava çi ye?**

Wekî tê zanîn bikaranîna ragihandinê di rewşa şer û berxwedaniyê de, meşandina nîvê şer e. Tiştê ku ji kurdên me yên rewşenbîr, siyasetmedar û hwd… tê xwestin ew e ku xebata xwe di warê ragihandinê de bi hêztir bikin. Bi vî awayî tiştê ku li vir çêdibe, ji raya giştî, sazî û rêxistinên mafê mirovan re ragihînin û şîrove bikin. Em dizanin gelek kesayetên kurdî yên xwedî bandor di rêxistinên hiqûqî û civakî de hene, lewma jî erk dikeve ser milê wan kesan ku bi riya wan rastiyan Şoreşa Rojava derxînin holê. Ji hêleke din ve divê her kurdek bikeve tevgerê, pêwîste bi riya belavkirina haştagên curbecur piştgiriya Rojava bê kirin. Herwiha divê gelê kurd li her devera ku lê dijî li ser asta cîhanê derkevin qadan, meş, semîner, mîtîng û hemû cureyên çalakiyan li dar bixin. Pêdivî pê heye ku ev çalakî jî bi xurtî bên domandin. Di heman demê de pêwîste rewşenbîr, nivîskar, siyasetmedar ji bo yekrêziya kurdî tevbigerin. Li aliyekî din jî piştevanya QSD’ê bikin, ji ber ku ew rastî êrişeke mezin li ser ragihandinê tên, bersivdayîna van êrişan jî dikeve ser milê hemû kesan. Li Rojava hêza kurdan a tekane QSD’ê ye, hûn girêdayî kîjan tevger, partî û çi aliyekî bin, QSD’ê nûnertiya we dike.

# 'Bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî wê berxwedana bendavê bi ser bikeve'

## Dayik û bavên ku temenê 80 salî derbas kirine, bi hemû hêz û îradeya xwe, li bendava berxwedanê a Tişrînê nobeta parastinê digrin.

**Birûc Resûl/ Qamişlo**



Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê êrişên xwe yên li dijî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi armanca berfirehkirina dagirkeriyê, didomîne. Dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ji 8'ê Berfanbarê ve dest bi êrişîn xwe yên li ser Bendava Tişrîn kir û ev êriş jî 26 roj didomîne, lê li kêleka van êrişan jî berxwedaniya gelên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rengekî bê hempa tê meşandim, em bûn şahidê van buyeran ku çawa zarokên 7 salî heya 80 salî bi îrade û hêzekî pir xurt berê xwe dane bendava Tişrînê û nobeta parastina wê digrin.

Derbarê berxwedaniya ku niha li bendava Tişrînê tê meşandin dayik û bavê ku temenê 80 derbas krine ji Rojnameya me re axivî.

Dayika bi navê Nergiz Dawûd ku di cihê xwe di nobeta parastina bendava Tişrînê de digre di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku berwedaniya ku niha li bendava Tişrînê tê meşandin ne berxwedaniyeke biçûk û hindike û wiha got: "Ez ji bajarê Qamişlo me, ez dayikek bi temenê 67 salî me û niha em li bendava berxwedanê a tişrînê ne. em dibînin ku çawa dewleta Tikk a dagirker êrişên xwe li ser herêmê dide meşandin û diwaze axa me bike bin destê xwe. Her wiha ev dmeke ku dagirkeriya Tirk êrişî bendava Tişrînê dike û wekî ku hemî cîhan jî dîtin ku çawa gelê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi îrade û hêz berê xwe dan bendavê da ku bandav bidin parastin ji êrişên dewleta Tirk a dagirker, lê me teva dît ku çawa dagirkeriya Tirk gel kir armanca xwe bi dehan birîndar û şehîd çêbûn. Çima dewletên cîhanê van sûcên ku dewleta Tirk a dagirker li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tîne xwe bê deng, kor û lal dikin. Em dibêjin besa ji bêdengiyê re, besa ji zordariyê û dagirkeriyê re, dewleta Tirk a dagirker çi dixwaze!, lê bila bizanbe ku ti tiştekî dewleta Tirk a dagirker li cem e tune ye, yê ku daxwaze axa xwe bike, em in kurd. Ji ber ku dewleta Tirk a dagirker wê axa me dagirkiriya, pêwîsta hemî dewletên cîhanê ji sûc û binpêkirinên ku dewleta Tirk a dagirker li herêma Bakue û Rojhilatê Sûriyê û bi taybet li bendava Tişrînê pêk tîne, bê deng ne mînin."

**'Em çavê xwe ji dijmin re naşikînin'**

Nergiz Dawûd di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Niha hebûne me li bendava berxwedanê a Tişrînê, ne tenê ji bo piştgiriya Hêzên QSD`ê yê ku niha di çeperên şer de ne, lê belê em niha wekî gel li bendavê kom dibin ji bo parastina destkeftî, ax û ava xwe dikin. Ji ber ku em hemî dizanin ku bêndav biçe wê rewşa herêmê bi giştî bikeva xeteriyê de. li ser vê bingihê em vê yekê qebûl nakin û em ji 7 salî heya 80 salî li bendavê ne û parastina wê dikin, da ku her ker bizan be ku em ji tu tiştî natirsin û tu carî jî em çavê xwe ji dijmin re na şikînin."

**'Em ê bi rihê şerê gelê şoreşgerî destkeftiyên şoreşa xwe bi parêzin'**

Di heman çarçoveyê de welatiyê bi



navê Silêman Ehmed ku ji bajarê Qamişlo ye wiha axivî û got: "Ez Welatiyekî bi Temenê 87 salî me û niha ez li bendava Tişrînê me. Hebûne gelê herêmê li bendavê ew e ku her kes bizane em qebûl nakin ku dewleta Tirk a dagirker bi hesanî were axa me dagir bike. em tiştek naxwazin, tenê bila dagirkeroya Tirk ji axa me derkeve û vî şerê xwe yê bê mirovî rawistîne. Em tenê ji dewletên cîhanê dixwazin ku li hemberî van êriş û sûcên kui dagirkeriya Tirk dide meşandin xwe bê deng nekin û hisab jê bixwazin. Em dibînin ku di cîhanê de kesek tê kuştin ewqas dewlet nerazîbûnê didin nîşan dan. Çima wiha li ser kurdan ne xwedî helwestin û xwedî mafin. Em jî mafê xwe diwazin, em ti carî pes nakin û heya dawiyê emê li ser piya bin, hêviya me ya serkeftinê pir mezine. Emê bi rihê şerê gelê şoreşgerî destkeftiyên şoreşa xwe bi parêzin."

# 'Hevgirtina gelan kelemeke li pêşiya armanca dagirkeran'

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê Ebdulselam Mehmûd diyar kir ku hevgirtina gelan di bin sîwana Rêveberiya Xweser de li pêş ketiye û got, "Hevgirtina gelan di dema niha de li Bendava Tişrînê mînaka herî berbiçav ya ku pêk tê û ev yek jî dibe kelemek li pêşiya armancên dagirkeriyê."**

Gel û pêkhateyên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin, bi sedê salan di bin gefên desthilatdarî û êrişên dagirkeriyê de jiyan dikirin. Herwiha desthilatdara heyî olperestî û nijadperestî di nav hemû pêkhateyan de li pêş xistibû. Lê bi salên ku şoreş hat lidarxistin, sîstema Rêveberiya Xweser hate avakirin. Sîstema Rêveberiya xweser hem destkeftiyeke mezin a şoreşê bû, hem jî serkeftineke mezin a hevgirtina gelan bû.

Bi saya Rêveberiya Xweser gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn yek dest, li kêlekê jî her pêkhateyekî bû xwedî rol û karîbû bi çand, ziman û nasnameya xwe jiyan bike. Lê ev yek li ser dijmin û desthilatdaran zor bû. Lewra bi lidarxistina şoreşê û heta roja îro dewleta Tirk a dagirker û tevahî dijminên biratiya gelan hewl didin,



ewlehiya herêmê têk bibin, fitneyan derxin, da ku vê hevgirtinê ji hev bixin û vîna gelên azad têk bin. Di heman demê de herêmê bi hêsanî dagir bikin. Lê Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi hevgrtina gel û şervanan heta roja îro hatiye parastin. Hevgirtina gelan rêya herî guncaw ya tunekirina planên dagirkeriya Tirk e.

Derbarê hevgirtina gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê Ebdulselam Mehmûd ji rojnameya me re axivî.

**'Xeta seyemîn parastina nirxê pêkhateya ne'**

Ebdulselam Mehmûd diyar kir ku wan xeta seyemîn hilbijart da ku hevgirtina gelan xurt bikin û wiha got: "Dema ku şoreşa Sûriyê di sala 2011'an de dest pê kir, me weke Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê xeta seyemîn hilbijar. Xeta seyemîn bingeha xwe parastina nirxên civak û pêkhateyan ne. Ji bo ku hemû civak ji bin zextên desthilatdarî û êrişan rizgar bibin, gelek şehîd hatin dayîn û gelek astengî hatin jiyankirin. Avakirina sîstema Rêveberiya Xweser a Demokratîk ne tenê nemûneya pêkhatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, lê bû nemûne ji giştî cîhanê re. Dema ku em li hemû sîstemên cîhanê dinêrin, tu sîstem bi qasî sîstema Rêveberiya Xweser mafê gelan nedaye, bi taybet jî mafê jinê. Îro sîstema li ser erdê tê avakirin ji bo gelên li Sûriyê jiyaneke azad û birûmet bijîn, çareseriya ku wê li Sûriyê giştî sîstema Rêveberiya Xweser pêk were."

**'Hevgirtina gelan di bin sîwana Rêveberiya Xweser de li pêş e'**

Ebdulselam Mehmûd anî ziman ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne tenê hevgirtina gelan pêk hatiye lê li kêlek wê jî hêzeke leşkerî xurt a birêxistinkirî hatiye avakirin û wiha got: "Yekîtiya gelan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hetanî asteke baş pêk hatiye, ew jî di bin sîwana Rêveberiya Xweser de pêş ketiye. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne tenê hevgirtina civakê xurt bûye, lê li kêleka wê jî birêxistinkirina hêzên leşkerî jî pêk hatiye. Yebûyîna gel û




hêza wê ya leşekerî di berxwedana Kobanê de ji giştî cîhanê re hate xuyakirin ku gelekî birêxistinkirî û hevgirtî li vir heye. Ew nijadperestiya ku dewletê bi sedê salan di nav wan de daye jiyankirin ji holê hatiye rakirin û çeteyên herî hov hatin têk birin."

**'Hebûna me bi hevgirtinê diyar dibe'**

Ebdulselam Mehmûd axaftina xwe wiha qedanad: "Di qonaxa heyî ya ku Sûriyê têde jiyan dike, Sûriyeke pirreng û nenavendî gerek e, ji ber ew çareseriya herî guncaw ji hemû pêkhateyan re ye. Da ku nirx, çand û zimanê her kesî were parastin. Herwiha di rewşa dijwar a ku herêm têde jiyan dike ji aliyê êrişên dewleta Tirk a dagirker ve, tişta ku dihêle ev hevgirtin bê parastin hêzên me yên leşkerî QSD'ê YPG û YPJ'ê ye. Hevgirtina gelan di dema niha de li Bendava Tişrînê mînaka herî berbiçave ku pêk tê. Hebûna me bi hevgirtinê diyar dibe. Li ser hevgirtina gelên herêmê şerekî taybet tê meşandin, lê bi berxwedan û têkoşîna xwe dikarin şerê taybet û êrişan vala derxînin. Em bang li miletê xwe dikin ku destê xwe bidin hev û yekîtiya xwe xurt bikin, cihê herî bi ewle û aramî lê heye, herêma Rêveberiya Xweser e. Cihê ku mirov dikare jiyaneke birûmet û azad lê bijî, Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Hevgirtina me wê bibe kelemek di çavê dijmin de."



# Li Bendava Tişrînê şervan planên dagirkeriyê têk dibin

## Rojnamevan Enes Yildiz diyarkir ku Dewleta Tirk a dagirker bi êrîşên xwe yên ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, hewil dide bi kumkujî û gef xwarina li ser rojnamevanan dengê heqîqetê tune bike.




**Amara Baran / Qamişlo**

Rojnamevan Enes Yildiz ku li bendava tişrînê de şahidî ji berxwedaniya gel û şervanan re kiriye divê çarçoveyê de ji rojnameya me re axivî.

**'Armanca dewleta tirk ew bû ku herêma firatê bike bin dagirkeriya xwe'**

Enes yildiz got ku " Piştê geşedanên ku li Sûriyê çêbûn bi taybet di 7.8 'ê Kanûnê de êrîşên Dewleta Tirk û komên girêdayê wê li ser Minbic, Bendava Tişrînê û Pira Karaqozaqê pêk hatin. Dewleta tirk bi gef û êrîşan hem bejahî hemjî bi balafirên xwe giranî da ser bendava Tişrîn û pira karaqozaqê. Piştî 10 roj şunda şer û pevçûnên ku pêk hatin yek armancê dewleta tirk hebû û dixwast bi komên xwe yên çete hem dixwast pira koraqozaqê û bendava Tişrînê derbasbike, di şer û pevçûnên ku 4 rojên destpêkê ku li bendava tişrînê pêk hat wek rojnamevan me xwe gîhand wê deverê û hem şerê ku li wir diqewime hem jî hewildanên dewleta tirk a dagirker ku dixwast pira karaqozaqê dagir bike şopand. Ew jî dihat wê wateyê ku derdora kobanê Sirîn, Eyn Îsa hemû dorpêç bike, lê plana ku dixwast nekarî pêk bîne û ew êrîşên wan ji aliyê QSD 'ê û meclîsa leşkeri ya Minbicê ve hatin têkbirin."

**Bi balafiran sûcên dermirovî pêk tîne'**

Enes wiha got " 50 roj zêdetire şervanê QSD û YPJ'ê di çeperan de liberxwe didin. Li ser bangawaziya Rêveberiya xweser a demokratîk bangawazî hat kirin ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina av, ax, û enerjiya xwe bikin berê xwe bidin bendava Tişrînê û zêdeyî 20 rojane ku gel li bendavê nobet digre. Dewleta Tirk piştî ku dît berxwedaniyeke bêhempa ji aliyê şervan û gel ve tê meşandin, êdî naskir ku nikare bi komên çeteyên xwe êrîşên xwe berfireh bike li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bendava Tişrîn û Karaqozaqê zêdetir giranî da balafirên keşfê. Piştî 5'ê çileyê Dewleta Tirk bi balafirên şer yên EF 16 jî kirin tevgerê.

**'Şervan ji bo parastina axa xwe bi bîr û bawerî şer dikin'**

Enes wiha got " Ji 2014'an heta niha geşedanên ku li Kobanê, Şengal û 2016 li Minbicê, û wiha di gelek bajarên Bakûr û Rojhilatê Suriyê de heta Reqayê gelek şervan bi çeka xwe li dijî DAIŞ'ê şer kirin û wiha domand" îro jî bi wê bîr û baweriyê ji bo parastina civaka kurd û ji bo gelê heremê şer dikin. Gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dema dibêje em xwedî fikir û felsefeyekîne û xwediyê vê axêne ew jî dide eşkerekirin ku gelekî ku xwedî îradeyek polaye. Cûdabûna QSD'ê bi fikir û ramaneke ji bo parastina gelê xwe canê xwe datînin holê. Ev 50'î rojin ku li bendava Tişrînê rûxmê hemû zor û zehmetiyan di eniya herê pêş de li dijî dagirkeriye û planên wan şer dikin. Di dîrokê de yên ku herî zêde lehengiyê dikin şervanên kurdin yên ku vî dinivîsên jî dayîk û rojnamevanên kurdin. Gelê heremê û kesayetên navdar û welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hevalên me yên Rojnamevan, şanogerê kurd Bavê Teyar û gelek kesayetên bi nirx canê xwe fedakirin, rûxmê wê jî gelê heremê soza tolhildana wan dide û dibêje ku em şopdarê şehîdên xwe ne. "

**'Di nav komên çeteyan de gelek çeteyên biyanî cîh digrin'**

Enes bibîrxist ku " Hesab û planên ku Dewleta Tirk dixwast pêk bîne du mehên xwe tije dike, bi hezaran çeteyên dewleta tirk hatin kuştin ew komên ku bi SMO bi navdikin û di nav wan koman de jî gelek çeteyên bîyanî ku ji wan re ozbek û çeçen dibêjin jî bi hemû hewildan û planên ku çêdikirin bi ser nedixistin. Şervanên YPJ'ê û yên QSD û gelê heremê ew planê ku li ser giştî Bakur û Rojhilatê Sûriyê hebû têkbirin. Dewleta Tirk gelek sûcên şer pêk anî û bi balafirên şer gelek kumkujî li ser gel pêkanîn."

**'Dewleta tirk hesab dikir ku herema Firatê dagir bike'**

Enes anî ziman ku "Fermandarên QSD'ê di daxuyaniyên xwe de jî dibêjin ku çi dibe bila bibe em ê rê nedin ku dewleta tirk bi wan komên çete rojhilatê Firatê dagir bike. Geşedanên ku di 27 Mijdrê de çêbûn piştî ketina Rejîma Baas a Beşar Esed du tişt hebûn heyet tehrîr el şam berê xwe da şam, himis, hama û wan hemû dever kirin bin desthilatiya xwe de. Dewleta tirk jî hesab dikir ku bi komên xwe yên çete rojhilatê firatê dagir bike. Berê jî li ser Rêveberiya xweser gef hebûn ku dixwastin giştî destkeftiyên gelê heremê bi gef û êrîşên xwe têk bibin. Dewleta Tirk bi firok û teknîka xwe armanc dike ku bendava Tişrîn û Pira Karaqozaqê re derbasê bajarê Reqa, Tepqa bibe û Kobanê dorpêç bike û giştî destkeftiyên heremê têk bibin, lê berxwedaniya ku şervanên YPJ û QSD'ê dane meşandin planên wan hemû valederxistin."

**'Şahadeta Nazim û Cîhan ji bona me pir bi êş bû'**

Enes diyarkir ku " Di 19'ê Kanûnê de du hevalên me yên rojnamevan Nazim Daştan û Cîhan Bîlgîn ku ji destpêkê de ji pira Karaqozaqê bigre heta Bendava Tişrînê ku li heremê çi diqewime bi pênûs û kamereya xwe ji raya giştî re ragihandin kedeke bêhempa dan meşandin. Dewleta tirk ji ber ku rastiyên ku herdû hevalan ji cîhanê re radigahindin tehemul nekir û bi balafireke bê mirov ew qetil kirin. Wek rojnamevanekê ji bo min kêliyeke gelek bi êş bû û min piştî şahadeta wan got ku ez gav paşda navêjim û min careke din hewilda ku li bendava Tişrînê çi diqewime û berxwedaniya ku tê meşandin hin zêdetir ji raya giştî re ragihînim. Her wiha çi dibe bila bibe em ê wek rojnamevan dev ji heqîqetê bernedin û heta dawiyê li ser şopa heqîqetê bimeşin. "

# YRD: Em ê têkoşîna Şehîd Azîz bi serkeftinê tacîdar bikin

**Navenda Nûçeyan**

**YRD'ê diyar kir ku 27'ê Çileyê dewleta Tirk bi rengekî tirsonekî li Ranyayê êriş pêk anî û di encamê de rojnamevan Azîz Koyluoglû şehîd bû û wiha got: "Helbet pênûsa hevrê Azîz li erdê namîne, deng û gotina wî dê hîn xurttir bibe."**

Koordînasyona Giştî ya YRD'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku Rojnamevan Azîz Koyluoglû 27'ê Çileyê di êrişa dewleta Tirk a dagirker a li Ranyayê pêkaniyî de şehîd bû. YRD'ê da xuyakirin ku dagirkeriya Tirk xwest bi vê êriş dengê heqîqetê bide sekinandin û wiha got: "Ên ku ji pênûs û gotina hevrê Azîz rehetsiz dibûn, bi êrişekî tirsonek berê xwe dan wî, bi vî awayî xwestin dengê heqîqetê bidin sekinandin. Lê divê bizanibin ku hevrê Azîz jî wekî yên berî xwe berdêl dayîn berçav giriye û ketiye vê karwanê, di her kêliya xwe de wek neferekî doza azadiyê tevgeriyaye û vê alê bi awayek xurt dewrî me kiriye. Sekna hevrê Azîz li hemberî dijmin serî natewîne. Ev sekna wî sekn û helwesta her hevalê wî yê ciwan e. Vê êrişê paşde gav bi hevrê Azîz neda avêtin û wê paşde gav bi me jî nede avêtin. Berovajî wê azweriya têkoşîna me mezintir bike."

YRD'ê da diyarkirin ku şehîd Azîz li her deverê xebat daye meşandin û wiha got: "Hevre Azîz ji Hewlêrê heta Silemaniyê û Kerkûkê, ji wir heta Mexmûrê û her dera başûrê Kurdistanê xebat meşand. Dîsa ji Dêrika Rojavayê Kurdistanê heta Efrînê li her cihê di her astê de xebatên weşanê ya ragihandinê meşand. Hevrê Azîz tenê nenivîsand, bi qasî vê axivî û ji bo dijminê qirker-dagirker teşhîr bike hemû derfetên di destê xwe de bi kar anî. Bêguman wê pênûsa hevrê Azîz li erdê nemîne, deng û gotina wî hîn geştir derkeve. Nirxên têkoşînê yên ku hevrê Azîz hiştiye, wê ji aliyê her kadroyê ragihandinê ve were mezinkirin û wê bibe haveyna pêşeroja azad a gelê me."

YRD'ê di dawiya daxuyaniya xwe de soza bilindkirina têkoşînê da



û wiha qedand: "Dijminê faşîst çi dike bila bike, serî li kîjan rêbazên dermirovî bide jî wê encam negire. Hêza wî têra neke ku rastiyê di tarîtiyê de bihêle. Çapemeniya Azad, mîna duh wê îro jî wek Azîz, ji Azîzan û şehîdên ku vê kevneşopiyê afirandine hîn zêdetir tiştan fêr bibe û wê bi hîn zêdetir karkirinê re vê kevneşopiyê bi serkeftinê tacîdar bike. Em soza xwe dûbare dikin ku em ê têkoşîna xwe bilindtir bikin."

# ‘Tirkiyê dijminê gelên Sûriyê ye û hevalê berjewndiyên xwe ye’

Serokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanî, Telal Mihemed anî ziman ku dagirkeriya Tirk dixwaze bi riya têkiliyên xwe bi rêveberiya nû ya Sûriyê re destwerdanê bike. Herwiha Mihemed tekez kir ku dagirkeriya Tirk dijminê gelên Sûriyê ye û hevalê berjewndiyên xwe ye.

Navenda Nûçeyan

Destwerdana hêzên biyanî di dosiya Sûriyê de ji salên destpêka kirîza Sûriyê ve heta roja îro mijareke serke ye, hêza yekem jî dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê. Derbarê mijarê serokê Partiya Aştiya Demokrat a Kurdistanî, Telal Mihemed ji rojnameya me re axivî.



**‘Tirkiyê dijminê gelên Sûriyê ye’**

Mihemed tekez kir ku dagirkeriya Tirk hevalê berjewendiyên xwe ye û dijminê gelên Sûriyê ye û wiha anî ziman: “Wekî em dizanin dema ku gelên Sûriyê dest bi şoreşa li hemberî zilmdariya Rêjîma Baisê kir, dewleta Tirk kete wê behweriyê ku wê şoreş guhertineke demokratîk bi xwe re bîne û wê ev yek bandorê li dewletên herêmî ji wan jî Tirkiyê bike. Lewma jî destwerdanek ji hêla dagirkeriyê ve hat kirin û riya şoreşê guherand ber bi pêkanîna berjewendiyên Tirkiyê û dijberiya gelên Sûriyê kir. Dema ku Şoreşa Rojava di 19’ê Tîrmehê de dest pê bû û gelê kurd saziyên rêjîmê û artêşa wê ji herêmê derxist, Erdogan bi giranî dest bi destwerdana di xaka Sûriyê de kir. Lema jî dewleta Tirk biryar da ku li dijî gelên Sûriyê kar bike, bi riya xistina hêzên muxalefetê bin bandora xwe û hembêzkirina çeteyên DAIŞ’ê ev yek pêk hat. Erdogan ne ji bo berjewendiyên gelên Sûriyê dijberiya Beşar Elessed dikir, lê belê ji bo meşandina berjewendiyên xwe yên siyasî û a dagirkeriyê di hundirê Sûriyê de bû. Di encama vê destwerdanê de aloziya Sûriyê kûrtir bû û gelek deverên kurdan hatin dagirkirin. Hetanî dema îro jî piştî ruxandina rêjîmê, dewleta Tirk vê siyasetê dimeşîne. Di dema hehî de li ser Bendava Tişrînê sivîlan hedef digire û dixwaze bendavê dagir bike da ku êrişî herêmên din bike.


**’Di roja îro de jî Tirkiyê dixwaze destwerdanê di rewşa Sûriyê de bike’**

Telal da zanîn ku dagirkeriya Tirk bi riya têkiliyên bi rêveberiya nû ya Sûriyê re destwerdanê bike û wiha domand: “Wekî em dizanin ku Erdogan û hikumeta AKP’ê dijminên gelên Sûriyê ne û tu caran nebûne heval. Da ku berjewendiyên dagirkeriya Tirk pêk werin, dixwest civînên lihevkirinê bi Essed re çêbike. Di destpêk de dema ku hêzên Rûsiya û Îranê destwerdan di dosiya Sûriyê de kirin, dewleta Tirk a dagirker jî destek da wan û civîna Asîtana ji hêla wana ve bi rê ve çû. Me dît ku çawa Îran û Rûsiya piştî ruxandina Essed têkçûn, dewleta Tirk ji wan re nebû sozdarê Dewleta Tirk a dagirker îro naxwaze gelên Sûriyê bi hev re diyalogê bikin û bigihêjin çareseriyekê û pirsgirêkên hundirîn ên Sûriyê çareser bikin. Em dizanin ku Tirkiyê li gorî berjewndiyên xwe bi Îran û Rûsyayê re digeriya. Di dema bûrî de destwerdana dosiya Sûriyê kir û îro jî dixwaze plana xwe ya Imparatoriya Osmanî pêk bîne. Di roja îro de ev dagirkerî bi riya hevdîtinên xwe bi hikumeta Demkî re peywendiyan çêbike û dîsa destwerdana xwe bidomîne. Dagirkeriya Tirk her tim astengiyan li hemberî yekbûna gelên Sûriyê çêdike. Piştî ku rêjîm têk çû, du hêzên biyanî (Îran û Rûsya) ji Sûriyê hatin derxistin. Di dema heyî de jî dewleta Tirk li Sûriyê maye, ew destwerdanê di dosya Sûriyê de dike û nahêle diyaloga sûrî-sûrî bi ser bikeve. Ev destwerdanên ku ji hêla dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ve tên kirin jî beşek ji berjewndî û siyaseta hêzên navnetewî ne.”

**‘Wê doza kurdî bandorê li destwerdana Tirkiyê di Sûriyê de bike’**

Telal Mihemed diyar kir ku wê doza kurdî ya Bakurê Kurdistanê bandorekê li hebûna Tirkiyê li Sûriyê bike û wiha got: “Di roja îro de rast e ku rêjîm têk çû, lê kirîza Sûriyê hîna didome, dewleta Tirk weke hêzeke biyanî dixwaze Kembereke Sinî, bi dirêjahiya Heleb, bajarên li ser Çemê Firatê, hata Mûsil û Kerkûkê ava bike. Bi vî rengî dewleta Tirk dixwaze hebûna xwe li Sûriyê bi hêz bike û hem jî Mîsaqa Millî pêk bîne. Lê hêzên navdewletî yên serwerên herêma Rojhilata Navîn in, vê kemberê napejirînin. Niha rewşa Bakurê Kurdistan û Tirkiyê rastî guhertinan tê, doza gelê kurd li wir li ser masê tê nîqaşkirin. Di gumana me de wê ev guhertin jî bandorekê li hebûna dagirkeriya Tirk li ser xaka Sûriyê bike, sînaroyên muhtemel wê ji niha û heya Adarê bên kirin. Dîsa em tekez dikin ku çareseriya kirîza Sûriyê diyaloga sûrî-sûrî ye û derxistina destên hêzên biyanî ji doza Sûriyê.”

## Doh terorîst bû, îro bû birayê ezîz!



Ahmet Aktaş

Li gorî fermiyeta Tirikiyê, HTŞ û rêberê wê El Colanî hîn jî di lîsteya terorîzmê de ye, lê Receb Erdogan li gel serokê MIT û wezîrê xwe yê derve, ew bi navê Ehmed Şe`ri û fermî bi statuya serokê dewleta Sûriyeyê pêşewazî kir! Ji xwe Receb Erdogan, frokeyek taybet şandibû ji bo anîna El Colanî û xanima wî Letîfe Durûbî.
Ev pêşwaziya germ, heman dostaniya malbatî û biratiya li gel Beşar Esad û Esma Esad re tîne bîra mirovan. Tê zanîn ku ew dostaniya germ paşê bû dijminatiyek germ û dijwar. Ka gelo ev dostaniya van “malbatan” heta kengî dewam dike? Niha “bila li hev bimbarek bin”! Ji xwe Receb Erdogan dibêje: “kêmzêde me li ser hemû mijaran li hev kir”. Ji bo rêveberiya Talîbana ya nû ya Efxanistanê jî heman gotin kiribû; “ji xwe fikrên me û wan, hema hema mîna hev in” û hwd. Çawa berî her dewletê Tirkiyê çû bi Talîbanan re têkilî xweş kir, bi heman zihiniyetê berî her dewletê çû Şamê jî. Di heman roj û heman seatan de li DYE`yê Trump û Netanyaho jî li hev rûniştin, li ser plansaziya nû ya Rojhilata Navîn xebitîn! Li aliyekî din Hakan Fîdan, ji bo ji vê plansaziyê bê par nemîne tirafîkek bi lez a diplomasiyê dide meşandin. Mînakek ji vê dîplomasiyê ji bo DAIŞ`yan ji girtîgehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derxe hewldanek balkêş dide meşandin. Dibêje,”em çar dewlet-Tirkiye, Sûriyê, Iraq û Urdun-, ji bo deh hezar DAIŞ`yan ji zindanan derxin, dixebitin! Bê guman armanca wî; DAIŞ’yan derxe; dîsa bi giranî li dijî Tevgera Azadiyê bide şerkirin, weke mînak li Tişrînê û her wiha berê wan bide hinek cihên din jî!
Li kêleka van bûyer û dîplomasiyan, roja pêncşemê, bi al û navê rêveberiya nû ya Şamê komek ji asayîşa Helebê û bi ala Berzaniyan komeke bê nav, çûn Efrîna dagirkirî ya bindestê dewleta Tirk de ye. Lê Ehmedê berpirsiyarê ENKS-Efrînê, pesindariya vê xwepêşandana şovane û karê Weqfa Berzanî ya li Efrînê û herêma vê derdorê dikir! Îca wisa diyar dibe ku piştî Sûriyeyê, Îrane û bi giştî li Rojhilata Navîn, tevlîhevî pir e û wê pêvajo gelek bi jan û gûman derbas bibe.
Gelek alternatîf û projeyên serdema nû hene, lê bi giranî du alternatîf li pêş xwuya dibin.
Yek; projeya nû ya ku xistine rojevê û hez dikin û lez dikin, da ku di demek nêz de, bi berfirehî bixin meriyetê, meşrûiyetê û fermiyetê ya ku bi pêşengtiya El Colanî didin meşandin.
Dudu; projeya ku ji 12 salan û vir ve, bi navê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Rojava bi rê ve diçe.
Ji bilî Tirkiyê, bi piranî daxwaz û hewldan ev in ku, van her du projeyan li hev bikin û bi hev re, bi pergalek nûjen û hemdemî rêveberiyek giştî ya Sûriyê ava bikin.
Heke ev pêk neyê, şensê projeya yekê lawaz e, lê şensê pêşketin û serketina mînaka Xweseriya Demokratîk zêdetir e. Ji ber ku demek dirêj hatiye ceribandin, xwedî serpêhatî û ezmûnek şênber e; pir netewan û pir baweriyan hembêz dike.

# Pêvajo têkoşîneke xurttir dixwaze



Cîger Efrînî

Di sala 1991’an de dewleta Îsraîl, Sûrîyê, Urdun û Filistînî jî dinav de li Madrîd’ê peymanek îmze kirin. Bingeha wê peymanê jî ev bû;’’li hember aştîyê ax’’. Yanê ji boyî aşitî pêk were, wê alîyek dev ji axê berde.
Dê başe, wan alîyan çawa ew naveroka peymanê ragihand raya giştî ya civaka xwe û cîhanê?
Israîl digot; ‘’ axa me girtî û di destê me daye wê Sûrîyê dev ji mafê xwestina wê axê berde, em ê pêvajoya aştîyê bi Sûrîyê yê re pêk bînin.’’
Sûrîyê jî digot; ‘’wê Îsraîl ji hemû axa me ku di Pûşpera sala 1967’an de dagirkirî derkeve û em ê pêvajoya aştîyê bi Îsraîl re pêk bînin’’
Rewşa wan û ya ku îro li Kurdistan’ê tê meşandin, hinekî dişibihê wek hev. Dewleta Tirk ya dagirker û qirker dibêje; ‘’wê PKK dev ji çekan berde û wê bi wî rengî aştî pêk were’’. Bi kurtasî radestbûna Tevgera Azadîyê dispêrin gelê Kurd. Kurd dixwazin ku; di encama vê pêvajoyê de hemû êrîşên li hebûna Kurdan û gelên din werin rawestandin, mafên Kurdan yên netewî werin dayîn û bi makazagonê jî têkevin bin ewlehîyê. Li gel wan mafê Kurdan yê xwe parastinê hebe.
Bê guman xwestekên Kurdan xwestekên herî rewa û di heman demê de jiyanî ne. Dewleta Tirk ya qirker û dagirker 102 salin ku, Kurd wekî tine tên hesibandin û bi gelek caran jî Kurd bi qirkirinan re derbas kir. Lê ji ber ku bav û dayîkên Kurdan li ser vê axê di serdema Neolîtîkê ji şoreşa Çandinîyê û avakirina gundan de pêşengtî kirine. Di heman demê de jî, bi Hûrîyan-Gutîyan û heta Med’an pergalekî konfederal sazkirine û bi awayê konfederalbûna jîyanî, mîna hin gelên cîran nehatine helandin û tinekirin. Ger ew damara kûr di axa Mezopotamya de nîn ba, me îro qala hebûna Kurdan nedikir.
Bi kurtasî; ji Koçgirî û heta derketina PKK’ê dewleta Tirk ya qirker û dagirker sîyaseta qirkirinê bi du awayan pêkanîn;
- Heta sala 1938’an qirkirina fîzîkî, ku her carê bi 10 hezaran Kurd hatin qetilkirin. Kurd wê pêvajoyê bi qirkirina sor pênase dikin.
- Ji sala 1938’an û heta rojaa îro qirkirina çandî û gîyanî; ev pêvajo jî wekî pêvajoya qirkirina spî hatî pênase kirin. (bê guman di vir de armanca min ne ew e ku hemû qirêjîya dewleta Tirk ya dagirker û qirker bînim ziman. Pêwîst be, mirov dikare kiryarên wan rêz bike. Lê divê bi tu awayî mirov dîrok û kiryarên wan jibîr neke. Jibîrkirin kiryarên dagirker tê wê wateya derî vekirin ji dubarekirina qirkirinên Nûh re)
Di wê heyamê de çi li ser nave Kurdan hebû hate qedexekirin û Kurd wekî gelekî tine hate hesibandin.
Rêber Apo bi Tevgera Azadîyê pêşîya pêşîn hebûna Kurdan bi Kurdan da pejirandin û pişt re jî bi dagirkeran da qebûlkirin. Yanê înkarkirin û tine hesibandina kurdan bêwate kir.
Belê, pêvajoyek heye! Lê di vê pêvajoyê de 2 xal girîngin;
1-Divê em wekî gel bi tenê guhên xwe bidin Rêber Apo û Tevgera Azadîyê. Dijberî wê çi dibêjin bila bêjin. Ya çarenûsa me dîyar dike Rêber Apo û Tevgera Azadîyê ye.
2-Xala din jî divê em wekî gel bi tu awayî têkoşîna xwe sist nekin. Wekî mînak pêngava ‘’JI RÊBER APO RE AZADÎ, JI PIRSGIRÊKA KURD RE ÇARESERÎ’’, xebatên pêngavê bên xurtkirin. Tiştekî ku em xebata xwe sist bikin li holê tine ye. Ne Rêber Apo fîzîkî azad bûye û ne jî pirsgirêka Kurd çareser bûye.
Her wiha ji ezmûna Filistînê em dizanin ku, gava li Madrîd’ê peyman hate îmze kirin, Filîstînîyan têkoşîna xwe sistkirin û çareserî pêknehat. Ji dîroka têkoşîna me jî em heman tiştî dibînin. Di pêvajoya sala 2013-2015’an de em bûn şahîdê wê jî. Ger me wekî gel û tevger derfetên ku Rêber Apo afirandi bû, baş hatiba nirxandin wê di sala 2016’an de Rêber Apo azad biba û di çareserkirina pirsgirêka Kurd jî gavên girîng hatiba avêtin.
Bi xulase; heta em Netewa Demokratîk bi awayekî têkûz nedin rûniştandin, jin bi reng û dengê xwe rista pêşengtîya xwe di hemû qadên jîyanê de misoger neke û ekolojîya welat û herêma me neyê sererastkirin, divê em ji her demê xurtir têkoşîna xwe bilind bikin. Xala herî girîng jî ew e, divê em rêxistinkirina xwe xurt bikin. Ji ber ku li cihê rêxistina civakê hebe, li wir xwe parastina cewherî heye û tu hêz jî nikare bi hêsanî çav berde destkeftîyên civakê. Ji hêla din ve jî civak bi rêxistin kirina xwe heye û dikare xwe biparêze. Ji xwe pêvajoya ‘’aştîyê’’ ne pêvajoya raketina li ser nirxên hatine afirandin, berowajî vê, pêvajoya bilindkirina têkoşînê ye. Her wiha heyama ku em tê re derbas dibin, ji me bilindkirina têkoşînê lûtkeya serkeftinê dixwaz e.



# Divê roja reş biqede û jiyan kirasê tarîtiyê biçirîne…!

26 sal in ku jêdera ronahî û azadiyê, Rêber Apo di qeydên tarîtiyê de li Îmraliyê rastî sîstema îşkence û qirkirinê tê. Lê bi têkoşîn û ramanên xwe zindan û hişmendiya civakê di serî de gelê kurd ronî kiriye. Lewma jî da ku koletiya cîhanî bi dawî bibe pêwîste roja reş biqede û jiyan kirasê tarîtiyê biçrîne.

Reşo Mihemed/ Qamişlo

Wekî tê zanîn di destpêka afrandina mirov de ew bi hev re di çarçoveya jiyana komînal de dijiyan. Lê ev yek ji hêla kesên desthilatdar ve bi şêwazê jiyana malbatî, bajarvanî û sermeyandariyê têk çû. Êdî civaka ku bi rihê komî ber bi ferdiyetê ve çû û her takekesek ber bi meşandina berjewendiyên xwe ve çû. Di serî de van hêzan civak ji hev xistin, cêwaziya maf xistin navbera jin û mêran de, pê re jî hiştin ku mêr bibin amûrek di destên wan de ji bo ku jinê bixin bin hikmê xwe. Li aliyekî xwezaya cîhanê bi sedema hêzên sermayedar û teknîka pêşketî bi kargehên ku zererê dide jîngehê, hat xirakirin. Bi domana demê re ji destpêka avabûna bajaran li ser asta cîhanê xweza û civak ji cewherê xwe dûr ket. Êdî civak û hawîrdorê civakê bi jîngeha xwe ya saxlem têk çû. Ji wan serdeman heta roja îro jî bi sedema hêzên kapîtalîst û hegemon ên ku li ser hîmê netew-dewletê cîhanê li gorî xwe bi rê ve dibin.

**Hêzên hegemon bi komplo û îşkenceyê jiyana civakê tarîtir kir**

Rêber Apo piştî pilaneke cîhanî ya ji aliyê hêzên komploger û hegemona cîhanî ve ya ku di 15’ê Sibata 1999’an de hat pêkanîn, di encamê de Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan, bi komloyeke navnetewî hate revandin. Herwiha ji wê demê heta roja îro di bin sîstema îşkence û tecrîdeke giran de ye. Ev pilan jî ne dûrî hêzên hegemon û desthilatdar hate meşandin. Lê belê xwesteka sereke ya wan hêzên hegemon û sermayedar bû, di serî de jî dewleta Tirk a faşist. Armanc ne tenê girtina fîzîkî bû, lê belê xwestin ku fikrên Rêber Apo dagir bikin. Lê belê Rêber Apo ji wê roja reş heta roja îro berxwedaniyeke bêhempa dike û xwe teslîm nekir. Mirov dikare bibêje ku bi girtina Rêber Apo jiyana civakê tarîtir bû û desthilatdariya li ser gelan kûrtir bû. Di serî de desthilatdariya li ser gelê kurd, gelê Xeza, Efxanistan, Îsraîl û hwd… Van hêzên komploger dikarîn alûziyan li Rojhilata Navîn û cîhanê kûrtir bikin û ev yek jî dûrî nirxandin û çavên rêbertî hat pêkanîn bû.

**Felsefeya Rêber Apo jiyanê ronî dike**

Hemû gelên cîhanê rastiya Rêbertî û gelê kurd nas kirine, gelek kesayetên biyanî azadiya xwe bi azadiya Rêber Apo re dîtine. Gelên Rojhilata Navîn û cîhanê bi giştî di nav pirsgirêk, kirîz û qeyranan de dijîn, Rêber Apo kilîda çareseriya van pirsgirêkan e di serî de doza kurdî. Ev felsefeya ku bangî azadiya jinê û civaka bindest dike, felsefeyeke nimûneyî ye û ne ji rêzê ye. Di çarçoveya xweza û jîngehê de jî Rêber Apo xwedî nerîneke cuda ye, ew her tim li ser jîngeha durst diaxive û dibîne ku girîng e jîngeh di hundirê civakeke azad de were parastin. Eger em balê bikişînin ser jiyana civakê dê bibînin ku Rêbertî dixwaze jiyana civakê ji milê fîzîkî û tewrî ve ronî bike. Li aliyekî, civak bi hişmendiyeke azad bijî û derdora wê ango xweza û jîngeh(Erdîngarî) dûrî atmosfera netew-dewletê, di çarçoveyeke saxlem de bijî. Rast e ku Rêber Apo feylesûfên serdemên beriya xwe xwendiye, tewrî û felsefeya wan feylesûfan naskiriye, lê belê ramana ku wî afrandiye cêwaztir, guncavtir û baştir e ji bo tevahiya gelên cîhanê. Ji ber ku ew biratiya gelan, parastina mafên jinê û civakê di çarçoveya jiyaneke aştiyane û azad de dipejirîne. Herwiha netewa demokratîk bi giştî ji bo tevahiya civakên cîhanê riyeke ber bi jiyana azad ve diçesibîne. Lewma jî fikr û ramanên wî jiyanê ronî dike, demokrasiyê li hemberî faşîzm, serwerî û kapîtalîstiyê bi hemû cureyên xwe ve dike bijartineke sereke.




**Êdî divê civak ronahiyê bibîne**

Çendîn ku Rêberê Navnetewî Abdullah Ocalan bi dehê salan ji bo gelê kurd, Kurdistanê hem jî azadî û aştiya cîhanî têkoşîn kiriye, lê dewleta Tirk xwestiye vê têkoşînê têk bibe. Di heman demê de faşîzma Tirk û sîstemên serwer ên cîhanî rê li ber têkoşîna Rêbertî û PKK’ê bigire, pê re jî projeya azadî û demokrasiyê tune bike. Lê ev yek ji destê dewleta Tirk derket û niha doza kurdî û projeya netewa demokratîk di destê gelên cîhan bi serkêşiya kurdan de ye. Îro jî dewleta Tirk li xwe mukir dike ku çareserî li Îmraliyê ye. Lewma jî Erdogan berê xwe da jêdera ronahî û çareseriyê(Gireva Îmraliyê). Çiqasî lîstik û fenên siyasî jî hebin, lê Rêbertî siyaseta faşîzmê fêm kiriye û wê riyên çareseriyê li hemberî van pilanan bi gulên aştî û azadiyê bixemlîne. Herwiha wê cîhanê bi ramanên xwe doza kurdî û pirsgirêkên di navbera hemû gelan de çareser bike. Ji ber vê jî pêwîste roja reş ya 15’ê Sibatê bi dawî bibe, gelê kurd bigihêje mafê xwe û tevahiya cîhanê ronahî û azadiyê bibîne.

## FENER

## Gelê ku heyranê azadiyê be, jîndar e



Idrîs Henan

Pêşketinên bi lez û geşedanên li ser hev desthilatên mayî xistine nava fikar û xofeke mezin ku asoyên tabloya siyasî li herêmê li gorî berjewendiya ku li bendê bûn, nayê xêzkirin. Lew re metirsiya wan ji serketina doza gelan zêde bûye û bi tayên parçebûn û biçûkkirinê re rû bi rû mane. Ji ber vê jî, her der ji bona serdestiya wan bûye dadgeh û dawa edaleta dîrokî jê têye pirsîn. Êdî tirsa wan ne bi dizî ye û ne jî dikarin veşêrin. Dibe ku heya demekê bi amûr, alav, rêbaz û reftarên cuda cuda projeyên xwemayîndekirinê dabin jiyîn, lê di roja îro de ev avantaj jî ji dest çûye. Çendîn hewl dabin ku li dora mafên gelan minewre bikin û bi hinek taktîkên klasîk ji nav bibin, lê têrê nekiriye. Ne jî odeyên şerê taybet ku 24 seatan di dewrê de ne ku çiqas derew hene dikin, karîbûn stûyê wan ji dadmendiya dîrokê rizgar bikin. Lê ji ber ku tevgerên gelêrî xwedî esil û kokên dîrokî ne, ti carî hebûna xwe li ser tunebûne zindiyekî din ava nakin. Nexasim ew zindî jî heman cins be. Lewma destê aşîtiyê her dirêjkirî ye û rêya pêkvejiyanê jî vekirî ye. Lê eger bijarde rêbazên sedsalên navîn ên qirkirin, tunekirin û xapandinê bin, wê çaxê asta sebra şoreşgerên azadiyê jî digihe lûtkeyê û ancax berxwedanek efsanewî û dîrokî ya bê hempa be.
Zîrweya sekna me li jor qalê kiriye, îroj li bendava Tişrînê hatiye teyisandin û bi hemû etîk û estetîka xwe govenda azadiyê ya hebûn û tunebûnê digerîne. Yek ji tabloyên “Semaya Vejînê” îroj li bendava Tişrînê têye xêzkirin û ji neyar û dagirkeran re, carek din bê dudilî, tivî dike ku dema miletek heyran û aşiqê azadiyê be, kesek nikare vîna wî ya hebûnê têk bibe. Êdî çîrok û propagandayên filan vekişî û nizanim filan dê vekişe, hîkayeyên berî xewê yên qesrên faşîst û neyarên nijadperest in. Dixwazin bi van gotegotên beredayî û plangeriyên egoîst ên nepenî ku di odeyên tarî de têne rêstin re, teoriyek zextê li ser raya giştî bikin û aqilê civakê manîple û dejenere bikin.
Armanca dagirkeriya ku kêlî bi kêlî, him li herêmên Parastina Medya û him jî li herêma Bakur û Rojhilatî Sûriyê, têkçûnên dîrokî jiyan dike, derxistina tevliheviya siyasî û avakirina heyameke bêbaweriyê ye.
Dewleta Tirk a dagirker ku weke dawîtirîn kelehên zilmê ya sîstema dewlet netew li herêmê li ber xwe dide, hewl dide bi ajîtasyona di derbarê têkoşîna gelê Kurd û hevalbendên wî de raya giştî bixapîne ku hinek armancên stratejîk ên fena; gurkirina nakokiyên siyasî navbera hêza Kurdan û hevalbendên wan ên koalisyona navneteweyî derxîne û tûşî vekişandina ji Sûriyê bike. Aliyek din ve jî, çi bizavek ber bi naskirina statuyeke Kurdan ve hebe, asteng bike ku şevpesta naskirina mafên Kurdan di çarçoveya sîstemeke federal de jiyan dike. Di çarçoveya siyasetên qirkirin û zordariya li ser hebûna gelê Kurd de, tirseke wisa jî jiyan dike ku êdî doza Kurdî refên odeyên dagirkerên Kurdistanê derbas kiriye û veguheriya dozeke navneteweyî. Ji ber wê jî bi metirsiya ku çarenûsa Tirkiyê jî weke ya Sûriyê be rû bi rû ye. Lew re, ne bi kêfa wê be jî, dê mecbûrî danûstandina bi Kurdan re be û wê bi zorê be jî statuya Kurdan li herêmê nas bike.
Ji bona vê jî; pêwîste gelê me ji her demê bêtir hişyar be û nekeve xefkên ajîtasyon û derewên faşîzma Tirk û amûrên wê li Sûriyê û herêmê.
Lew re pêwîste gelê me li hemberî vê cureya êrişan bi hêza xwe ya siyasî, leşkerî û ewlehî re bibe yek bedin û li dijî van êrişan, ji bo misogerkirina çarenûseke azad, bi vîna parastina hebûnê re, Semaya Vejînê bike.

# ‘Hedefgirtina konvoya gel sûcên şer in’

Avêsta Resûl/Qamişlo

**Rêvebera Rêxistina Mafên Mirovan a Sûriyeyê Evîn Cuma, diyar kir ku hedefgirtina sivîlên ku parastina bendavê dikin sûcekî dijmirovî ye û bêdengiya cîhanê dibe sedema ku sûcên dagirkeriya zêde bibin.**

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê konvoya gel yên sivîl ku berê xwe didin bendava Tişrînê hedef digire. Di encamê de jî bi dehan welatî birîndar û şehîd bûn. Di vê çarçoveyê de Rêvebera Komeleya Mafê Mirovan Evîn Cuma ji rojnameya me re axivî.

**‘Êrişa herî metirsîdar yên li dijî Bendava Tişrînê ne’**

Evîn Cuma di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Êrişên dewleta tirk a dagirker ku li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rengekî bê navber têne meşandin, di heman demê de hin deverên wekî Efrîn, Girê Spî, Serê Kaniyê û di vê dawiyê de jî Minbic jî dagirker, ev hemû sûc û binpêkirin li dijî zagonên mafê mirovane. Di dawiya sala 2024’an de piştî ketina rejîma Baas welatiyên Efrîn û Şehbayê careke din bi darê zorê ji warê xwe hatin koçberkirin. Piştre êrişên dagirkeriya Tirk ku li dijî Minbicê destpêkir, gelek sivîl ji Minbicê jî koçber bûn. Ên mane jî rastî gelek binpêkirinên wekî dizî, talanî, kuştin û êşkenceyê hatin. Ew sûc û binpêkirin jî bi dîmenan hatin belgekirin û ji bo raya giştî hatin ragihandin. Bêguman êrişa herî metirsîdar a li dijî bendava Tişrînê ye ji ber ku ew bendav çavkaniya jiyanê ji bo Sûriyê bi giştî ye û jêdera kehrebe û avê ye.”

**‘Banga parastina bendavê dikin’**

Evîn di berdewamiya axaftina de wiha got: “Hilweşîna bendavê wê karesateke mirovî ji bo herêmê bi giştî û ji bo gundên li ber aliyên çemê Firatê bîne. Ji ber wê jî rojane bi sedan şênî berê xwe didin bendavê da ku parastina wê bikin. Lê ew welatiyên sivîl jî dema ku bi awayekî aştiyane di xwepêşandanan de banga parastina bendavê dikin, ji aliyê balafirên şer û yên bê mirov ve tên hedefgirtin. Gelek alî dibêjin ku li vir sivîl wekî mertalên zindî tên bikaranîn, lê belê ya rastî ne wiha ye. Jiyana wan welatiyan, gund û bajarên wan ji ber hilweşîna bendavê jî di metirsî û xeteriyê de ye. Ji ber wê jî ew bi aştiyane banga rawestandina êrişên li dijî bendavê dikin.”

**Li ser gel her roj komkujî têne kirin**

Evîn Cuma da zanîn ku dagirkeriya tirk bi êriş û kiryarên xwe sûcê şer pêk tîne û derveyî zagonên mirovahiyê tevdigere û wiha pê de çû: “Dewleta tirk wan kesê ku dengê xwe bilind dikin û rastiya heyî ji raya giştî re radigihînin hedef digire. Her wiha dagirkerî diwaze bêdengî hebe û ti kes van sûcên ku ser gel û axa Sûriyê pêk tîne newe eşkere kirin. Me dît ku çawa rojnamevan jî ji aliyên dewleta Tirk a dagirker ve hatin hedefgirtin û di encamê de jî bi dehan birîndar çêbûn û hin ji wan jî şehad ketin. Mixabin em dibînin ew kesên ku birîndaran rizgar dikin û wan dighînin nexweşxane jî tên hedefgirtin. Ev çend care ku ambolansên Heyva Sor a Kurd ji bo ku birîndaran rizgar bike, tên hedef girtin.”



**‘Banga me ji bo rawestandina êrişan e’**

Evîn Cuma di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku pêwîste zagonên navneteweyî hebûna artêşa Tirk li ser xaka Sûriyê ne rewa û ne axlaqî bibîne û wiha got: “Banga me ji bo rêxistinên hiqûqî ew e, ku van binpêkirinan belge bikin, ji ber rewşa ewlekarî zehmetiyan li pêşiya xebatên şopandina sûcan, qurbaniyan û aliyên berpirs derdixîne. Her wiha banga me ji bo rawestandina êrişan û destpêkirina pêvajoya diyaloga siyasî ji bo avakirina Sûriya nû û sazkirina destûreke nû ku tê de sivîl û hemû pêkhate werin parastin.”